

# NEWROZ



Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.

Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (149) Sal 26 10ê Gulana 2021 z - 2633 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# Gazinek bona pêdiviya hişyarbûnê



**Desteya sernivîser**

Diho wilo bû, îro jî wiha ye. Di zagona xweristê, cîhana ajal û ya qaşo mirovan de, tu cih, rêz û rûmet ji belengaz, sifîl û bêhêzan re tune ye, her qels ji xurt û hêzdaran re taştê û firavîn in! Di vî warî de, pêximberê Ola Islamê birêz Muhemed (Silavên Xwedê lê bin) Jî teqez kiriye ku: «Bawermendê xurtî hêzdar, ji yê qelsî sifîl çêtir e».

Îro, ku em dîn û bala xwe bidin dewletên Ewropa Rojavyê, tevî ku ew dewletine azad, xwedî al, hêz û artêş in jî, lê da ku ew berjewendiyên xwe biparêzin û tu hêzên mezin wan tune nekin, danequrtînin, li Çiriya Paşîna sala 1991an Yekîtiya Ewropayê ava kirine ku hejmara wan îro bûye 27 dewlet û di cîhana me ya îroîn de ew xwedî deng, rol û rûmet in.

Di vê derbarê de, pirsek derdikeve holê bersivê dixwaze, ew jî ev e:

Ma em Kurd weku gel, li Rojhilata navîn, hejmara me ji 50 milyon morovî bêtir e, bi destên hêzên mezin ên cîhanê li gel xaka welatê xwe di nav 4 dewletan de hatine parçekirin û ji hemû mafan bêpar mane, nemaze ji wan mafên ku di belgeyên Rêxistina Navnetewî(UN) de cih girtine, ma gelo pêwistiya me .....

2

## Pîrozbahî... Roja Rojnamegeriya Kurdî

**Bi boneya 123 saliya derçûna Rojnameya «KURDISTAN» li ser destê Mîr Midhet Miqdad Bedirxan ku ew roj bûye «Roja Rojnamegeriya Kurdî»**

**Bi navê Desteya Weşana NEWROZê, em hemû nivîskar û hezkirên Zimanê Kurdî û gelê xwe pîroz dikin!**




کردستان
بسم الله الرحمن الرحيم



# Avakirina pilatformekê ji bo rizgarkirina Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Sipî erk û stubarî ye

**Memê Alan**

Piştî borandina sê salan di ser dagîrkirina Herêma Efrînê re û bêtirî salekê di ser Serê Kaniyê û Girê sipî re, û ew salên tijî binpêkirin û tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê, ji kuştin û girtin û destdirêjiyên namûsê û işkenecekirinê de bigir ta fewdalîzim û serberdayetiya ewlehî, guhertina demografî û niştecîkirina anîndeya di malên niştecîyên resen de, avakirina niştecîgehan, teqandina makîne û matorên dutekerî û bombeyên teqîner di nav sivîlan de, revandin û veşartinên zorane, qurkirin û hilkirin û şewtandina dar û daristanan, rêşkirin û kolandina cîgehên kevneşopî û dizîna keneşopan û entîkeyên binzemînî, wêrankirin û roxandina zaretgeh û gor û goristanên pakrewan û kesayetiyên siyasî û rewşenbîrî û civakî, jiholêrakirin û tarûmarkirina simbolên Kurdan û nirxên din ên giranbuha, guhertina navên resen ên kastîn û meydan û kolan û avahî





û cîgehan bi navên Turkî û Erebî, destdanîna ser malmewalên niştecîyên resen çi yên mane yan ên koçberkirî, ferzkirina vêrgî û baceyan, êrişkirina ser malan û talankirinê, bikaranîna nasnameyên bi herdu zmanên ( Turkî - Erebî), hildana ala Turkiyê li ser sazî û dezgehên fermî, fêrkirina zimanê Turkî û Erebî li dibistanan û qedexekirina zimanê Kurdî, bikaranîna pereyên Turkî li rex ên din, derxistina zeyta zeytûna ya Efrînê bo bazarên Ewropa û Emrîka û firotina wê di bin navê ku li Turkiyê çêbûye de, dizîna endamên laşên mirovan û pê bazirganîkirin, dorpêçkirin û nehîştina ketin û derketina xelkê wan herêminan, topebakirina herêmên ku koçberên Herêma Efrînê lê dimînin mîna Şeba›i û Şêrewa - Bakurê - Heleb, hewildana berdewam a Dewleta Turkiyê ya dagîrker tevî nandozên Sûrî yên tundrew û terorîst ên pêve girêdayî bo dagîrkirina hin herêmên din ji herêmên Kurdî û herewa bo tunekirina hebûna Kurdî û rola wan li Sûriyê,...Û HWD; Diviya bû Tevgera Kurdî ya Siyasî bi kêmanî bi xwe bihesiya, li xwe vegeriya di kûderê de şaş kiriye û kêmkasiyên wê çi ne û çi jê tê xwestin? Bi kêmanî jê dihat xwestin dev ji ezezî û nakokî û xirecir û berjewendiyên kesayetî û partîtî yên teng berda û bejwendiyên gelê xwe berçavbigirta, lihev biciviya, lêvegerek damezranda, û bi her awî hewibida wê çawa berevaniyê di ber doz û gelê xwe de bike. Lê mixabin, ji ber ku ev tiştên me li jor gorine nehatiye kirin û cîbecî nebûye, tiştê tê kirin di asteke pir nizim de ye û ne li gor serpêhatiyên vê gelî me yê qehreman û perîşan e, û partiyên me ta vê kêlîkê di ezezî û gizgiziyên xwe de vedigevizin û hinda ne û bûne dîl ji hin dewletên herêmî yên dagîrker ji Kurdistanê (Turkiyê, Îran) û partiyên Kurdistanî û bi taybetî (PKK, PDK) re, û li gor berjewendiyên wan tevdigerin û nikanin xwe jê rizgar bikin û li gor berjewendiyên gelê me yê Kurd li Sûriyê xwedî pirojeyeke serbixwe û azad bin; Wêlomê, ji maf û erkê xelkê me yê Efrînê û herêmên din ên dagîrkirî ye (Siyasetmedar, rewşenbîr, kesayetên civakî yên xwedî rol, komele û rêxistinên mafên mirov û mafnasînê û partiyên Kurd ên baweriya wan bi karekî weha ji bo rizgarkirina herêmên Kurdî yên dagîrkirî tê) ji bo berevaniyê di ber Efrînê û Serê Kaniyê û Girê Sipî de, vegera koçberên wan herêman bo cî û warên wan bi rengekî aram, û derxistina hêzên Turkiyê û milîseyên Islamewî yên pêve girêdayî ji wan herêman, pilarformeke serbixwe damezrînin.

---

**Gazinek bona... Dûmahîk**

bi rêkeftin û yekîtiyê ji ya hemû gelên cîhanê ne bêtir e?!, ma gelo çima û bo çi her û her me berê xwe daye hev û pişta xwe ji niyarên hebûna xwe re vekirî hiştî ye û kî di ber vî gunehê mezin de berpirsyar e?!

Dibe ku hin reşbîn bêjin: Bavo, qedera me Kurdan ev e, li ser eniya me hatiye nivîsandin ku wiha blindest, dîl û riswa bijîn! Lê, rastî ne wiha ye, rastî ew e ku bi pilan, dek û dolabên dagikeran ev, kuştar, bobelat û tewan hatine serê me û hê jî berdewam in, û dema li beşekî serhildanek çêbûye, bi lez û bez, neyarên me civiyane û bi hev re şerê wê kirine û têk birine.

Girîn, xwelomekirin, gilî û gazin tu sûdeyê nadine me, tê xwestin ku em şiyar bin, dest hilînin, bi hişmendî û dilsozî li doza gelê xwe xwedî derkevin, rê li pêş nifşê nû dûz bikin, û derfetê bidin kesayetiyên xweser da ku hemû bi hev re rola xwe bilîzin, bi destên xwe êş û birînên xwe derman bikin û bawer bin ku bê pêkanîna yekîtî û hevgirtinê, her em ê dîl û bê rûmet bijîn!

Belavkirina vê çand û gotarê û xebat di ber de, erk û ustubarê hemû zana, rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd e.

# Nameya dostê gelê me yê Kurd, nivîskarê Turk ê mezin û navdar Ahmet Altan

**Wergêr ji Turkî: Dildar Şeko**



KURD Birayên minin Kurd. Ez bixwe Tirk im. Ezim yê ku bi dîn, bi ziman, bi çand, bi rewişt û gerdişên vî welatî mezin bûye û ji xweliya vê axê zayiye. Ezim yê ku axa Enedol û Mezopotamyayê ew xwedî kiriye. Hindik jî be, ezim yê ku berhemên wî di wêjeya cîhanî de hatiye parvekirin. Her ezim ew nivîskarê ku pertûkên wî li Frensa, li Almanya, li Britanyayê hatine wergerandin û ji aliyê cemawerekî berfireh (wekû) siyasetmedar, nivîskar, dadwer, xwendewar, rewşenbîr û bîreweran ve dihête xwendin. Rast e Erdoğan min daye girtin, Rast e wî min avêjtiye girtîxanê, Rast e sizayê sermedî yê girtîxanê daye min, Ev hemî ji bo min ne xem in. Heta bi roja îro ez ne tirsiyam, Ger bizanim ezê bimrim dîsa jî ji Erdoğan natirsim. Ez nikarim bi Erdoğan lê, Erdoğan nikare raman û baweriyên min bikirre. Li Tirkî du mêr û jinek hene ku bi tirsê û bi dravan nayêne kirîn. Yek jê Selaheddîn Demîrtaş, Yek jê Ez, Yek jî Fîgen Yüksekdağ e. Mêjûya cîhanê Williams Shakespear bi ew berhemên wî yên mezin bi bîr dihêne lê, gava pirsa mîrê wê serdemê bihête kirin, kes nizane ew mîr kî ye. Erdoğan jî wusa. Piştî demek din kesek dê wi nenase û dê bihête ji bîrkirin. Mirovahî bê çawa Shakespear bi bîr dihêne dê min jî wusa bi bîr bihênin. Gava bihête xwestin ez netewperestek im. Min serkeftinên xwe yên netewperestiyê di encama xebatên xwe yên hunerî de bi dest xistiye. Di çavên aliyê bijarde (elît) yên Awrûpayê de, heger; “wey gidî, li Tirkî ramyarên wek Ahmet Altan jî hene” bihête gotin ji bo min rûmet e. Eve netewperestiya min. Gava ku dibêjin; “Yilmaz Guney , Orhan Pamuk, Yaşar Kemal, Nazim Hikmet, Mewlana Celaledinê Rûmî û Fazil Say`ê wan heye” navê van kesan netewperestiya min e. Gava ez van navan li Awrûpayê dibîhîsim; HESTÊ MIN YÊ NETEWPERESTIYÊ DIFÛRE. EZ DIBIM NETEWPEREST. EZ BI TIRKBûNA XWE SERBILIND DIBIM. Min dixwest netewperestên faşîst jî bi wergirtina serkeftinên werzişî, zanistî, aborî, siyasî, pîşeyî, felsefî û demokrasiya li Tirkî NETEWPERISTIYA xwe anîbana ziman. Lê (mixabin) ew qêrînê heldibijêrin. Ya ALLAH bismillah Allahû Ekber, yan jî, Şehîd namirin welat dabeş nabe û her wusa NETEWPERESTIYÊ dikin. XWEDA, CIVAKÊN BÊ PÎŞE, BÊ ZANIST Û BÊ FELSEFE ji rû xwe dihavêje. XWEDA TERKA TIRKAN KIR. YAN JÎ, Ji ber ku misilmanên sexte û netewperestên faşîst in, WEKÛ XWEDA DI QUR`ANÊ DE NIVÎSIYE, TIRKAN HELAK DIKE yan jî TUNE DIKE. Heger ramanên xwe neguherin wê dabeş bibin, dê parçe bibin. Tenê tişta ku divêt bikin (ew jî) baweriya bi demokrasiyê ye. Berî bi ٢٢ salan ez çûme terzîxanê min xwest çend pantelonan bidim dirûtin. Yê terzî qiyasa min digirt. Her di wê gavê de ٣ genc ketin hundur. Yek ji Rîze, yek ji Amedê û yek jî ji Dersîmê bû. Her ٣ genc jî di ١٦-١٥ saliya xwe de bûn. Her yek ji wan li bajarekî hatiye dinê. Her sê di yek tîma fitbolê de wek bira cih digirtin. Gava yê terzî pîvanên min digirt, ez jî bi gencan re hinekî axifîm. Piştî yê terzî pîvanên min bi dawî anî vegeriya ser genca û daxwaza wan pirsî. Zarokan, wek formayên tîma Inter ya Îtalî, ji rengên kesk û sor û zer forma xwestin. (Li ser vê daxwaza zarokan) Yê terzî hêrs bû û bi dengekî bilind bi zarokan de qêriya û got; ma hûn terorîst in. Zû ji vir biqeştin, heger na ezê gilyê we li cem polîsan bikim. Zarok çûn, terzî li ber min xwe li dayîka zarokan dapîvand. Min şerm kir. Min nema zanî berê xwe bidim kû. Terzî bêyî şerm bike berê xwe da min û pirsî; Ahmet beg ma ez ne mafdar im? Min jî jê pirsî; mafdariya çi? Terzî, Rengên kesk û sor û zer li welatê me qedexe ye, got. Min jê pirsî; çima? Terzî got; ev rengên kurdan e. Bi van rengan dixwazin welatê me perçe bikin. Min nexwest pê re bikevim gengeşê. Bi nermî min jê re got ku carek din ez nayêm vir. Ji wir derketim û carek din venegeriyam wê dikanê, lê ew roj û kiryarên terzî yên li hemberî wan zarokan ticarî ji bîra min neçûn. Ez TIRK IM lê ew roj TIRKBÛN ji bo min bû nîjadek cihê şermezariyê. Mirovê Kurd dikare bibêje; ji Wanê me, ji Sêwrekê me, ji Bîngolê me, ji Qersê me, ji Colemergê me, ji Mêrdîn im, ji Riha me. Lê ji tirsa de nikare bibêje Ez Kurd im. Ji Amedê me dibêje lê nikare kurdbûna xwe bibêje. Belê dikare .....

4

# Diniya dijminê Kurd e, û Kurd jî dijminê Kurd e?!

**Mihemed Qere Hesen**



Wek dîroka gulaşiyê dayî zanîn, ku nakokî di civakên mervane de xwezaye û livînerê wan ê aborî, çekdarî û ramaniye, û wê li qonaxekê derbas yek din dike. Tevî ku ziyan di hemî aliyan de tê kirin û birîna wan kûr û hûr dibin.

Lê tevî ku Kurd gelekî bin dest e, û welatê xwe parçeye û aboriya wan piranî diherike genc û berîka serdestên wan, û di tentêlek pir dijwar re derbas dibin û jiyanek paşmayî dijin û ji hev bela û piringpiringîne, yekîtiyê di civaka kurdî de cihê xwe negirtiye ev jî hin sedemin xwe hene:

= Rewşa civaka kurdî di her dema xwe de ne li gor daxwezên wan dozkirî bûn, çi ji hêla bingeha xwe ristinî ve û çi jî ji aliyê diblometîkê ve. Di serdem derbegiyê de axekî an şêxekî eşîrekê dikanî şoreş an serhildan bi gotinek wî re gur biba û rawestiya. Wan nîran jî hêşt ku ew serkêşa wan tevgeran bikin. Û dîn jî xwe kûr berdabû hemî movikên civakê bi gotina şêxekî an ayetêkê re xelk li ber wan bi lehiyê de diçûn, û sedî sed wan dikir ku ji aliyê xwe ve biratiya olî cibibicî bikirina. Serkên wan tevegeran bi hêsanî bawer dikirin û dihatin xopandin. Ji ber ku aliyên daxweza mafê gelê Kurd dikirin wek gawir û zindîq bi nav dikirin û şikandina wan rewa didîtin. Wê sedemê hêşt ku kesên ne li gor erk û astan daxwezan bibin serkêş û zû werin kirîn û firotan, wek nimûne kirina Îzdîn Şêrbeg.

Civak di aliyê zanistiyê de bi şêweyê mebest û akamî li şûn hêştibûn, ku bi hêsan liv û tevgera wan di destê zordaran de hile û ji qasnaqa wan bi dernekeve. Civak ji karê konevanî û diblometîkê bi dûrdixistin ji ber ku fêrî lisk û zanîna wî karî nebin. Gava miletek dewleta xwe tûne be fêrî karê wê nabe, herdem li gor bayex, tîtal û şêweyên di civakê de .....

5

**Nameya dostê... Dûmahîk**

navê bajarê xwe dibêje lê, Nikare bibêje; ez kurd im. Heger bibêje, bi guman wekû terorîst dê bihête binavkirin. Ditirse ku em jê re bibêjin; tu xayînê wetenî. Li Tirkî birayên min Kurd hene. HEVAL û HOGIRÊN min Kurd hene. BIRAYÊN MIN KURDÊN MISILMAN hene. Li vî welatî HEVALÊN MIN YÊN ÇEPREW û ŞOREŞGER hene. Birayên te Kurd hene ku hûn bi hev re li yek mizgeftê nimêj dikin, li yek yarîgehê bi hev re şahiyê dikin, li yek kargehê bi hev re dixebitin, bi hev re eraqê vedixun, bi hev re govend û dîlanan digerînin, bi hev re çayê vedixun û bi hev re legaziyan dikin. Xuşk û Birayên me Kurd hene, di yariyên niştîmanî de gavaTirkî dikeve hêrişê heldiperin, gava bi ser nakevin xemgîn dibin. Hûn dizanin ku ev Kurdan ji sedî ٨٠ Kurdên HDP`yî ne? Aha ev Kurd in ku di her gavê de bêyî şerm û bi şêweyê herî kirêt hûn ji wan re terorîstên PKK`yî dibêjin. Digel ku ne terorîst in, digel ku çek ranekirine jî em ji wan re dibêjin; hûn tirk in. Çima ku Kurd in em li hemberî wan nîjadperestiyê dikin. Aha ev Kurdên ku hûn wan dibînin, ew Kurdên HDP`yî ne. Ew xuşk û birayên me ne. Ewên ku bi hebûna xwe vî welatî û çanda me zengîn dikin, ewên ku bi stranên xwe, bi muzîka xwe me şad û bengîn dikin, ewên ku bi xwarina wan em zikên xwe têr dikin, ewên ku bi zimanê xwe zimanê me, bi govendên xwe dîlanên me, bi şevbuhêrkên welêt malên me geş dikin, ewin û ew xuşk û birayên me ne. Ez wekû Tirkekî, ji ber zulma ku me li Kurdan kiriye ji tirkbûna xwe şerm dikim. Ji roja damezrandina Komarê ve, ewên ku me ew tune heljimartin, ewên ku em dixwazin zimanê wan tune bikin, ewên ku em bi rewişt û gerdişên wan galte dikin, ewên ku em bi zar û zimanê wan henekên xwe dikin, ewên ku di zindanên Amedê de em bi wan îşkence dikin, bi destpêkirina tevkujiya Dersîmê re ewên ku me gundên wan bombardûman kirin, ewên ku me Mûsa Enterên wan, Wedat Aydinên wan, Sawaş Buldanên wan kuştin. ewên ku me Yilmaz Guneyên wan, Ahmed Qeyayê wan mişext kirin, ewên ku me bi dirêjiya ٧٥ salan nehişt navê kurdî li zarokên xwe bikin, ewên ku me heta bi salên 2000`an nehişt li muzîka xwe guhdarî bikin, ewên ku dewletê bi dehan zarokên wan kuştin û digel ku kujer dihate zanîn jî, me navê kuştiyên wan failî meçhûl danî. Li Roboskî, ew ٣٥ kurdên ku bi (balafirên) f١٦- me bombe li wan barand û me ew kuştin. Ewên ku me milletwekîliyên wan avêjtin zindanan, ewên ku me Belediyên wan bi darê zorê ji wan stand û desteser kirin, ewên ku me serokên wan yên siyasî, Yuksekdax û Demîrtaşê wan avêjtin zindanan. Ew Kurdan xuşk û birayên me ne. Ji kiryarên me yên li hemberî Kurdan mêjûyê şerm kir lê me ji kiryarên xwe şerm nekir. Ji van Kurdan em çi dixwazin? Ew xuşk û birayên me ne. Digel rêzdariyên min Têbiniyên ji girtîxanê


***AHMET ALTAN***

**Diniya dijmin... Dûmahîk**

dixebitin. Ji ber wê tentêla piraniya serekên Kurdan ne şareza û pisporên konevaniyê bûn. Ew rewşa ta roja îro bû sersedema çêkirin û parçêbûna partiyan û vê tentêla ne xwezayî bi xwe re kes in ne li gor berpirsiyaryê bin û keysebas ew ên ku berjwendiya xwe ya kesan û partîtî di ser tevgera konevanî û yekerêziya wê re digirin, û dibin kelem li pêşa saz û dûzankirina karê xebatê. Gav hinek jî parîk hêz bi dest dikevin bikomê partiyan çêdikin û wek kevirên damê li rex xwe datînin ku xwe demokrat û bi hêz bibînin. Ew kara ji hişê dîktetoran tên, ew jî dibe gelşek li ser rêya yekirina hêzên konevanî.

= Hin sedem jî hene ji derveyî daxwez û vîna gelê Kurd e.

- Dewletên kurdistan di navbera wan de dabeş bûye, roleke xwe pir mezin heye ku Kurd negihîn hev. Ew bi doza gelê Kurd re wek dagîrker didin û distîn, ji ber dewlemendiya Kurdistanê tim çavên xwe li xêr û bêr wê yên ser zemînê û bin zemînê ne, herdem bi tevgera wê ya rewşenbîr û civak, û konevanî bi dek, dolab û pilanan vê re têklidar in, ne wek beşekî nîştimanî ji wan welatana dibînin. Gav liv û tevgerek çêbibe bi destên ji agir û hesin li wan dixin. Tim dikin ku tevger konevanî ji hev parçebin, di rêya kirîna kesên keysebaz û yên kêm



di nav wan de çandine, ta ku ne mitan û tebatiyê di rêyên dirûşman û jarkirina rêxistin û partiyên û perçekirina wan re, raku baweriya gelê Kurd bi wan nemîne, raman û rêxistina konevanî di civaka Kurd e jar bikin. Girîngiya ramana rêxistinê di sazkirina gelan de nas nekin û bê nirx bimîne, ew bibe rêber û şivan, wek hatiye zanîn ku bê rêxistin tu gel nikan xwe birêv bibin, Ji ber dijminê gelê Kurd baş dizanin ku rola rêxistin û sazkirinê çî ye. Herdem kar dikin ku wê ramanê bişkînin. Ew di ragihandina xwe de Kurdan wek niştecî dibînin lê tevegerên wan ên konevanî û rewşenbîrî û…gawir dikin û rewa nabinîn, geh bi tevgerên xinz, bêbext, noker û terorist bi nav dikin û geh jî bi cudaxwezî û pareçekirin walêtê wan bi nav dikin û tu xesyet û rewiştên pîs nahêlin serok û pêşngên kurdan bi nav dikin.

Çiqas dewletên kurd di bin destan de ji hev kînkêş bin û ji hev ne razîbin, di tenga tevger û xebata kurdan re zêt di nabera wan re nare, û destan didin hev ku bişkînin. Nimûne li sala 1962 an hin hêzin leşkerî yên Sûriyê wek piştgir ji leşkerê Îraqê re şandin, ku şoreşa Berzaniya nemir biroxînin. Û gêrbesta Cezayêrê li 6ê avdarê di navbera Îraqê û Îranê de kurd hatin kirîn û firotan. Niha jî êrişkirina dewleta Turk ji kurdistana bajşûr re û destêwerdan wan ji beşê rojava re û dagorîkirina wan ji hin herêm kurdî re ku kanibe xweseriyê li rojhilatî Ferêt hilweşîne, û bi şev û roj bi Şamê û Tehranê re kardikin ku Kurd li Sûriyê mafê xwe nestînin û bi qaserî kanin me ji hev bidizin û gelşan din navbera tevger û partiyên Kurde tûj bikin û agirê nakokiyên wan gur û hêgin bikin.

- Sersedam mezin ji dabeşkirina Kurdistanê re berjwendiyên dewletên xwedî biryar di cihanê de hukardar bûn, û wan ev bela û babelîta mezin bi serê Kurdan anîne li gor nînka berjewendiyên xwe bi dewletên kurdan diçewsînin re têklidarin, di kefteleftê de Kurd ên herî jar in, ji ber wê zû tên pêlê kirin û çewsandin.

- Wan dewletên mezin nekirine ku dewletên kurd dibin destan de berve dewlet in demokrat û çareserkirina doza kurdî têvnedana, û li dêvla wê bi ber ristên faşî û dîktetorî têvedan. Ev ton dewlet tucaran mafan nadin kesî, ji ber wê ji gelê xwe û bi yê Kurd re bûn kêrbend û babelît bi serê wan anîne, bi ser de jî hemî xêr û bêrên van welatan li boşbelaşiyê şewitandin û hêj li ser wê rêyê berdewamin, û welatên xwe di hemî waran de kirine dozex.

- Dewletên mezin rêz û giramî ji belge û rewayên navdewletî re negirtine, tevî ku wan bi xwe jî ew belge mokirine, û rêz û giramî ji mafên miletan re negirtine. Ji bo berjewendên xwe cîhan kirine daristaneke hovane.

Piştî deh salan ji kuştin, hilweşandin û gurkirina şerê çekdarî rewş û deraqê sûriyê ji hêla hemî dewletên destêwerdan ve tê keyandin, tu aliyan nivişka gelê sûrî bi sergihayî bi dest xwe nexist, û çiqas lîsk, dek û dolab gerandin nikarîn wek ew dixwezin li aliyê xwe çareser bikirana. Ji hemiyan re nas û zelal bûye, divê li hev bikin û nivişka gelê sûrî li xwe parve bikin.

Wek ji gotinan tê xuyan ku di bin masê re hev dibînin û çav hev dikin ku vê deraqa ya aloz bi şêwekî berve çareseriyê têvedin, û diyar dibe ku nexşeyên konevan werin .....

6

# Rêvebirî huner û berpirsyariyeke gewre ye

**Nûşîn Bêcirmanî**



Di civakên mirovayetiyê de, bi hemî cureyên xwe ve, peyvin hene rojane têne bikar anîn, weke serwer, serdar, berpirsyar û rêveber, di wateya xwe ya giştî de nêzî hev in, ji ber tuşta wan bi heve girê dide RÊVEBIRÎ ye, ev rêveberî çi ya malbat, hoz, rêxistin, sazî û partiyan be jî, heman wateyê dide.

Di partiyan de jî, li gor tozik û avhiya wan ya rêxistinî, dê gelek berpirsyar tê de hebin, her yek ji wan jî dê berpirsê komîteyekê be ku ji çend endaman tê ava kirin; Çendî ev berpirsyar zîrek, têgiştî û çalak be, wilo jî karê wê komîtê dê berçav û bi encam be.

Ji ber giringiya rol û bandora berpirsyar di karê partiyan de, ez dê nêzî vê têrma BERPIRSYAR bibim; berpirsyar çiye? Kî ye?gelo çawa biserdikeve û herweha deteya ku berpirsyarê wê ye jî biser dikeve û partiya wî bi xwe jî bihêz û çalak dibe.

Bê guman, berpirsyarê çalak û zîrek, dibe lêvegera wan hevalên ku berpirsyariya wan dike, ji bo vê, gerek her berpirsyarek xwe bi rastî berpirsyar bibîne, hin merc li cem werin peydakirin ta ku karibe bi barê berpirsyariyê rabe.

1 – gerek xwediyê pêbaweriyek sincî be, Ji ber yê ku bi pîvanên sincî ne pabend be, ew nikare ji hevalên xwe bixwaze ku bi wan nirxan pabend bin.

2 – Divê xwedî çand û bîreweriyeke rêxistinî, siyasî, civakî û rêvebirî be.

3 – Yê berpirsyar gereke bihin fereh be. Di biryar û helwestên xwe de ne gerim û bilez be.

4 – gerek Guhdarvanekî baş be, berpirsy arê serkeftî ..... 7

---

**Diniya dijmin... Dûmahîk**

guhartin, û hinên nû werin çêrkirin ji ber ku piraniya aliyên dijberiyê bi pirogramên xwe yên konevanî û leşkerî hatine şkandin û ezwer û daxwezên hemî aliyên milî, olî û konevanî cihên xwe di pirojeyên wan de tune bûn, û nerindî di dermafê hev de jî kirine, ji ber wê girîngiyek çêbûye ku ev dijberiya heye di hemî aliyan de wrin guhartin û yên sûcdar û tewankar werin ber dadgehan.

Li gor rewş ji dûr ve tê xuyan û ser defter çi ji aliyên kurdî tên xwestin berî bihar were xwe jê re amade bikin.

Weke pêşiyên me gotine dera yekbûn lêheye hêz û dewlet li wire. Ji ber ronahiya vê gotinê pêwîstiya danheva mala kurdî xwe dide pêşî, ew ji di rêya goftûgoya berpirsyar û ji berjewendiya bilind a doza Kurd bikşe û di qasnaq û çarçewa doza kurdî li Sûriyê de wer kirin û nakokiyên partiyên kurdistana bakûr û başûr neynin nav xwe û ji gelşên wan xwe bişon. Wek diyar bûye ku kînga ji hev xêlî bibin li nav garisê kurdên Sûriyê şerê xwe yê raguhandinê dikin û me li vir jî parçe dikin li ser zar û zimanê me hevdu dikin xiniz û bêbext û …hwk. Ew jî pir caran kesîtî û taybeta doza me ya Rojave rêznegirtin û ji bejwendên bîrdozî û partîtî hatine. Û hinan jî xwe dîtine ku ew nûnertiya Kurdên sûrî bikin.

Wek em dizanin ku di vê rewşa Sûriyê de destkewtên mezin wek hêzên leşkerî û xweseriya rêvebir, rû sipî û... Me bi xwîna şehîdên xwe û piştgiriya hêzên kurdistanî standine. Ta ew werin paristin û pêşxistin yekbûna konevanî, civakî, leşkerî û pirojeya konevanî gerek in.

1- **Yekirina pirojeya konevanî (destûra rêvbira xweseriyê)**, berî her tiştî divê hemî pêkhateyên kurdî çi rewşenbîrî, yasayî û kesên serbixwe li rex tevgera konevanî di goftûgoya kurdî de beşdar bin, di civatek fere de daxwezên gelê xwe li Sûriyê belge bikin.

Pêşniyar ew e ku şêweya rêvebirina xweseriyê jê re belge wek **Destûrekê** pêşniyar kin ku sbe di destûra nû ya Sûriyê de cihê xwe bigre. Wek sbe destûrek şarîstanî ji tevhiya welêt re were danîn ya bi xweseriyê ve girêdayî wiha be jî. Ji ber ku divê destûrek taybet bi xweseriya li herêmên kurd jî heye, ta ku bi şêwekî zelal rêvebirî were ajotin. Ji ber ku jî hemî aliyên ne kurd li Sûriyê ji ber berjewendên xwe çi olî an netewî û herêmkî ji ber xwediyê dozê ve tutiştî pêşniya nekin.

2- **Yekirina tevgera civaka kurdî bi hemî aliyên xwe ve**, ev yekbûn hemî partî û pêkhatên civakî hen di çarçewek nû de werin kom kirin bibin nûnerên gelê Kurd di hem têkliyan de, û serketina doza kurdî serketin ji hemî pêkhatên civaka kurdî çi kes çi sazî re ye. Û wê hemî pêkhatên sûrî rêza û girama me birgirin û rêyê li pêş hemî neyarên Kurd di welêt de û çi dewletên netewa Kurd diçewsîne de werin girtin.

3- Şeweyê ku Kurd xwe biparêzin û berdewam bikin, pêwîstiya xwe ne kêmtirî bendên li jor nîşan bûnye, û bi hêsan sernakeve jî, jê re karê nerm û bihn ferhiya dirêj dive.

# Teror û bêdengî!

**Pêşmergê bê nav**

Ji dehan sal ve Li bajarên Ewrupa, welatiyên sîvîl li Kolan û avahiyan bi destên Terorîstên Islaman tên serjêkirin û kuştin.

Karbidestên Ewrupa li hember van bûyeran şêt û heyirî mane. Berpirsyarên Ewrupa her ta Îro jî, newêrin van bûyerên hovane yên bi serê milletê Sivîl tên bi durustî û ronak binav bikin an rastiya pêkhatin û sedema van terorîstan binav bikin.

Kî li pişt e, çawa terorîst peyda dibin, ji kuve tên, kî wan ramanên tarî û hovane dike serê wan xortan, kî dijatiya Ewrupa di dilê wan de diçîne, kî wan hînî ceng û êrêşan dike, kî soza buhîşta li Esmana dide wan nezanan, kî navê wan terorîstan dike şehîd, li ku û çawa tên xudîkirin, kî rêya çewt û dilreşiyê dixe mejîyê wan û kî pişt û propagende ji karê terorîsta re dike, kî li mediya û Îmamê mezgeftan bi pûl û hebûn dibe xwedî û pişt?!

Eger em bêjin ku sedema nediyarkirina van guneh



û karên qirêj nezanîna asayîşa Ewrupa ye, ez dibêjim ne rast e, ji ber ku polîsên Ewrupa bi hêz in û her di warê agahîyan de gelek şareza û şiyar in.

Lê ji bo çi bingeh û pişta wan terorîstan ji aliyê hukûmetên Ewrupa ve nayên diyar kirin û terorîst karê xwe her berdewan dikin?

Ji bo çi ew dewlet, Hukûmet û Saziyên ku Terorîstan xwedî dikin ji alîyê Ewrupa ve nayên binav kirin?

Ez dibêjim terorîstan kanîbûn ta îro terora xwe ya qirêj li Kolan, dibîstan, zanîngeh, rojnamevan û her welatiyek ewrupî bi karbînin bêyî ku hukûmetên Ewrupa bikanibin serjêkirina welatiyên xwe ji destê terora Îslamiyan biparêzin. Ew jî ji ber van sideman e:

- Deweletên ku terorîstan xwedî dikin li Ewrupa bi hêz in, xwedî Lobî û piştgêr in.
- Piştgêriyên terorîstan, navê dînê Islamî kirine mertal û piranîya Mezgeftan bûne dibîstana Kultûra dijîtî, zikreşî, tawanbarî, ramanên tolhildan û Cihadê.
- Berjewendiya abûrî li gel wan dewletan re nahêle ku welatêd Ewrupa wan dewletan di warê terorê de eşkere tawanbar bikin an jî bidin nasîn.
- Polîtîka dubendiya cihanî: Ewrupa û dewletê Emrîkayê yekbûyî li alîkî û dewletên Rûsyayê Federal li alîyê din, bûye sedema wendakirina an jî veşartina gunehkirina wan dewletên ku teror û terorîstan pêktînin û ji bo pêkanîna berjewendiyên xwe, di destê xwe de kirine şûrê tolhildanê û li cîhanê belav dikin.

Berjewendiya Ciyopolitîk dihêle ku ew dewletên terorîstan xwedî dikin û li cihanê belev dikin, bi serbestî bi navê olê Islamî terora xwe bikar bînin.

Ew dewlet kanîbûn ta îro dubendiya cihanî ji bo xwe bikarbîne û li pişt wê perdê hîlebazî û qirêjiya terorê bi destê xwe ve bike çek û tirsê têxe nav civata cîhanê.

- Perçebûna dewletên Ewrupa di cenga hembrî teror û hukûmetên ku terorîstan bikar tînin.
- Her weke dîroka Imparatoriya Osmanî îro jî wilo li Ewropa hatiye. Çawa ku dewletên Ewrupa yê rojava piştgêriya Osmaniyan li dijî Rûsya dikirin û rê nedidan Rûsya ku dewleta Osmaniyan bişkîne, îro jî û weke herdem nevîyê Osmaniyan polîtîka xwe bi her şêwekî dibe serî û .....

8

**Rêvebirî... Dûmahîk**

dizane baş li şîretan guhdar be, sûdê ji nerîn û helwestên hişmendan di komîta xwe de werbigre.

5 – gereke berpirsyarê komîtekê dadmend be, ango endamên komîtê tev li cem wî weke hev bin.

6 – gerek rexnê li ser xwe bipejirîne û bi hestekî berpirsyar li hember raweste ji bo endamên komîtê waneyan û sûdê ji helwestên wî bigirin.

7 – gerek fişarê li diyaloga endaman neke, bi mebesta ku biyar û helwestên wan weke ya wî be, ev tê wateya ku ev endam divê xwedî kesayetîne siyasî û bîreweriyeke çandî, civakî û rêxistinî bin.

Bê goman wê mercin din jî hebin, ku peydabûna wan li cem berpirsyar dê sûdeyê bide kar û xebata van endaman bi hev re.

Bo vê jî dibêjim berpirsyarî hunerekî herî bilind e, eger peyda bibin wê ew berpirsyar û komîteya wî tim û tim bi pêş de herin û gavine berz û berçav bidin.

# Korona_name...

Xeleka Duwemîn

**Dr. Memo Abdî**



Çareserî û xweparastin... Xêzên çareseriyê... Berî hertiştî weke me di xeleka yekemîn de tekez kiribû, ku gava herî sereke û çarenûssaz di vê nexweşiyê de danasîna wê ya çi bi riya amûrên pişknînên taqîgehî be (PCR), an jî di riya wênekişandina tomografî (chest-Ct-Scan) be. Piştî ku nexweşî tê destnîşankirin pêwîste, dest bi çareseriyê bike bi şêweyekî lezgîn li gor van xalên lijêrnimandî:

1.berî her tiştî rûniştina di malê de, bêyî ku tu hîç têkiliyan bi kesekî re ta bi endamê malbata xwe re. Pir giringe tu xwe goşegîrbike di odeke taybet de dûrî hevjîn û mindalan.

2. Bi fermanê ku nîşana herî diyar û xuya di vê nexweşiyê de bilindbûna têhna laşî, tê xwestin ev têhn were daxistin jêr pileya 38. Ji lewre pêwîste tu libên paracetamol 1000 li gor pileya têhna laşî bibe.

3. Pêwîste tu vexwarina avê bike kar ji xwe re û ne kêmî 5 litra di rojê de tu bibî.

4. Guvaşên mêw û fêkiyan tu çiqas bibî baş e. Ji bo bergîriya laşî xurt û bihêztir bibe.

5. Goşt qedexeye ji bilî goştê spî, çênabe bê xwarin bimîne. Tevî ku dilê yekî ji xwarinê maye lê pêwîstiya laşî bi xwarinê heye.

6. Laş pêwîstiya wî bi hemî cureyên hesinan û vîtamîna heye ji bo karê bergîrî û berxwedana xwe berdewam bike.

7. Pêwîste tu serê xwe bi ava sarogermo her 6 kajêran bişoyê da ku laş vehesê û têhna wî carna bi avê dadikeve.

8. Vitamin C, Zink, vitamîn D û hemî cureyên vitamin hebin , pêwîste tu laşê xwe ji wana bê par neke.

9. Rûniştin û drêjkirin li ser tex û kenebeyan ne tiştê herî guncaw e, divê tu liv û tevgera xwe di mal de zêde bike ji bo xwîna te baş bigerê û sistema xwînger û lîmfger çalakbibe bo cenga bi Coronavirus re bi sûd û mifa be.

10.kesê ku temenê wî zêdeyî 50 salî be pêwîste dermanekî xwîrihnker bibe mîna aspirin , clopiogrel an jî Rovaltro bi armanca xweparastinê ji krîzên dil û mejî.

11. Nexweşê ku dermanê dil, tansiyon û şekir dibe divê wana ranewstîne û li ser dermanê xwe berdewam be.

12. Ji van hemî xalan giringtir ewe ku nexweş naçar e bi moralekî bilind heye û pêwîste xwedî derûneke bi hêz be, da ku ji heqê berxwedanê derkeve û vî virus î pîs bike û pozê wî bi erdê ve bihesikêne.

Di dawî de ev tiştên ku min ji we re xêzkirin rênima û rêkarên giştî ne bo pêketî û tûşbuyên bi coronavirus. Ji bilî van tiştan pêvedayê korona divê têkiliyan bi bijîjkê pispor re bike û ti zêdegaviyan bi xwe neke û xwe neke hosta û şehreza .ji ber ku çi şaşîtî çêbibe, bi xwe re dawîka tragîk ji nexweş re tîne. Bi hêviya ku min çend xalên nediyar ji xwêner, şopîner û tûşbuyên koronayê re pêşkêşkirin bi zimanê kurdî, da ku hûn pabend bin bi van rênima û şîretên giranbuha ji hêla min ve.

---

**Teror... Dumahîk**

Ewrupaya rojava nikane xwe li hember terora Erdogan biparêze.

- Nimûne: Elmanya piştgêriya Fransa nekir û serok Macron bi tenê di bûyerên dawî de li meydana cenga Erdogan hîşt. Carna meriv digot qey ew terora li Fransa bûye li dijî Kesayetiya serok Macron e, hinek medya dixwestin wilo jî bidin xuyakirin.

Bi vî awayî jî dixwazin rastiya Terorê veşêrin û xwe li pişt van Propagande kirên xwe yên qirêj bidin paqij kirin. Li Pişt van sedem û erjewendiyan teror pêkhat, roj bi roj her ferehtir dibe û tirs li nav civatên Ewrupa û milletên cîhanê roj bi roj xurtir dibe, Kurd jî bê hemdê xwe ketine nîvê cenga navdewletî. Eger Kurd çi bikin çi nekin, hêzên navnetewî yên weke Rusya, Emrîka li gor berjewendiyên xwe yên aborî û armancên ciyopoltîk bi alîkariya Karbidestên dewletên herêmî bi kar tînin.

Di vê demê de, mafê milletê Kurd hîç ne di pîlana wan de ye. Mafê mirovan li gora berjewendiyên xwe yên navdewletî şîrove dikin.

Hilweşandina bajaran, qirkirina netewan, koçberkirina milletan weke pêwîstiyekê didin nîşan kirin.

Ev Grupên Tirorîst ji ku hatin?

Çawa bûn hêz, xwedî çek û balafir?

Em jî pêwîste hêviya xwe bi azadiyê ji bîra nekin, divê em xwe qels nebînin, xwe ji armanca serxwebûnê bi dûrnexin, Ji me re bilî rêya berxudana çekdarî, pêwendiya diplomasî, xebata mediya çi bi nivîsandin nîne.


Divê em her dem banga: yan Kurdistan, yan neman bi dengê bilind, bi şev û roj, li welat û penabriyê li ser mafê xwe şiyar bin, bi xurtî û dengê bilind li her cî û her deran bê tirs û bi serbilindê bankin.

*Ji Koçberiyê: Buhara 2021*

# Çima em pêl hev dikin?

**Zanistê Comê**

Guftûgoyek zirt û tûj di navbera seg û rovî de li ser giringiya Cejna Newrozê li we pîroz be û sersalan peydabû û her yekî nirênek ji hev cuda dide. Rovî dibêje: Di cejin û sersalan de xwarin li ba mervan pir dibe û pir caran ji ber wan dimîne têra me û lawirên din jî dike, bi kêmanî em birçî namînin û em hewceyî dizî û aloziyan nabin ku zikê xwe têr bikin. Seg li rovî vedigerîne û dibêje: Erê belkî li ba hin merivan di cejin û sersalan de xwarin pirtir dibe û ji ber wan jî dimîne em cureyên lawiran sûdê jê dibînin û di wan çend rojan de têr dibin, lê piştî wê bi çend rojan rewşa dijmantiyê di navbera me de wek berê vedigere. Ya baştir ew e ku em wek min û pisiyan bikin, bi mervan re sax û durust bin bi delewerî û fûtan pê nekin herdem winê têr bin, tu carî ez û pisîkê malê tî û birçî ne manin. Xwediyê malê her roj taştê û firavînê dide me û her demekê bi sabûna bîn xweş serê me dişo û ziwa dike. Vêca, emê çawa xwediyê malê ji lawirên biyanî û dizan neparêzin û çawa pisiyê çiwalên nîsk, nok, ceh û gênim ji mişkan neparêz e? Ez pêşniyarî te dikim ka tu jî tevlî me bibe emê te bi şivanê mirîşkan kin! Dema rovî bêjeya şivantiya mirîşkan dibîse, erê dike û bi segê malê re dibêje: Li te dimîne ku tu xwediyê malê razî bikî ku te bike şivanê mirîşkan. Lê divê xwediyê malê her roj min têr nan bike. Roja yekê rovî ji şivantiya mirîşkan vedigere, xwediyê malê mirîşkan dijmêre ku ya qurşînî kême, ji rovî dipirse? Rovî bi mêranî bersiva xwe dide û dibêje: Ezbenî bawerke pilingê hatiye mirîşkan, ger ez ne jêhatî û mêrxwazbama wê mirîşk tev bixwarina. Xwediyê malê xwarina pisiyê, seg û rovî danî ber wan û derbasî mal bû. Roja diwem rovî ji şivantiyê vedigere xwediyê malê mirîşkan dêjmêre ya gewir û şîn kêmin, rovî dibêje: Ezbenî tu baş dizanî zarokên bi çûk hewcedarî xwarinê ne? Lê şêrê hatî ye mirîşkan gelekî mezin û bi hêz bû ger ez ne xwediyê pêlan û fûtan bama bawerke qet mirîşkek ne dighêştin mal wê tev tar û mar bibana. Wek roja yekê xwediyê malê xwarina hersê lawiran dayê lê bala xwe dabû yê ku xwarina rovî wek berê mabû û ji rovî dipirse: Tu ji sibê ta hêvarê diweste ma çima te şîv xwe naxwî? Rovî bersivê dide: Bi xwedê ez bi zik êşê ketime ez nikanim şîva sar bixwim. Roja siyemîn dema rovî vedigere xwediyê malê çav li mirîşkan dikeve çend mirîşk û dîkî toxim tunene di wê demê de gotina bav û kalan tê bîrê (ji şîrî ta pîrî), dide dû rovî û seg lê hevoje. Rovî direve li paş



xwe nanêre lê tiştê herî balkêş seg jî ji ciyê xwe nelivî û hema nekir gewt jî, dema rovî direvî, xwediyê malê şêtmêt dima! Rovî sê rojên wîne li ba me bû şivan û ji berê ve bi derewan û fûtan tê naskirin, lê ev segê segbav ku ewqas sal in li ba mine û her roj bi taştî û firavîn bû, di dema gerek de xwe ker û lal dike. Vêca ezê baweriyê bi kê bikim, segê ewqas sal li ber derî gava gerek deng bi xwe nexist û rovî ne ciyê baweriyê bû, xuya dibe ku lawir pêl dûvê hev nakin. Ma çima em pêl hev dikin!

# Newroza hemû dayîkên kurda pîroz dikim...




**Nojîn Qidso**

*Min xwe naskir ku di*
*dîroka îro de Newroza*
*me Kurda peyda dibe...*
*Hîn ez nedimeşîm te ez*
*di nava hembêza xwe de*
*vedişartim dayê...*
*Wê hîngê min tenê*
*dengê dilê te dibîst...*
*Hîn ez mezin bûm te bi*
*destê min digirt di wê*
*şevê û em dibezîn, ji min*
*bû em ji xwe re dilîzin...*
*Lê piştî ez bêtir mezin*
*bûm, em bi tirs dibezîn...*
*Wê demê min naskir*
*planek li dijî xwesteka*
*min û te digere...*
*Min zanî jî çima di wê*
*rojê de guman çavên*
*min dişewtîne, hêstirên*
*min tevlî tirsê dibarîn...*
*Sal derbas bûn heya ku*
*min fêmkir guneha me*
*hebûna me ye...*
*Lê tu carî dayê te dev ji*
*dengê xwe, ji bez û leza*
*xwe li pê rastiya me*
*berneda...*
*Tu sal derbas nedibûn*
*bêyî ku tu hestên me bi*
*cilên netewî bixemlînî...*
*Ez cara yekem, cara*
*herî bi bandor ji te*
*fêrbûm dayê...*
*Min evîna welat di nava*
*bijangên*
*çavên te*
*naskir, di*
*her awirên*
*te de, di her*
*bêhnvedanekê de...*
*Ji ber vê ezê te jî dayê li*
*gel newrozê pîroz bikim,*
*vê carê û herdem...*
*Newroza hemû dayîkên*
*kurda pîroz dikim...*

# ZANÎNGEHA ROJAVA

**Amadekar: Arif Hiso**



Zanîngeha Rojava di sala 2016´an de hate avakirin, di destpêka avakirina xwe de ji pênc fakulteyan pek dihat, yek ji van fakulteyan, fakulteya wêje bû, di salên despêkê de tenê ji beşa ziman û wêjeya Kurdî pêk dihat. Tevî ku ev beş nû bû û cara yekemîn li rojavayê kurdistanê tê vekirin, lê pêşwaziya xwendekaran ser pir bû. Beşa ziman û wêjeya Kurdî derfeteke mezin bû ji gelek hezkirên zimanê Kurdî re, ji ber wê ev kes û pir kes in din jî tevlî fakulteyê bûn ne tenê ji bo bawernameya wêjeya Kurdî bi dest bixin, lê ji bo ku xwe di ziman û wêjeya Kurdî de kûrtir bibin û xebatên berfireh derbarê wêjeyê de bikin.

Di her du salên despêka avakirina zanîngehê de salên xwendinê li fakulteya wêje du sal bûn her salek sê qonax bû (werz), lê di sala 2018´an de sîstema zanîngehê hate guhertin êdî salên xwendinê yê wêje bûn 4 sal her salek ji du qonaxan bû, yanî xwendekar dê 4 salan bixwîne ta ku karibe ji beşa wêjeya Kurdî der biçe.

Ta niha 73 xwendekar ji beşa wêjeya kurdî derçûne ( ev xwendekarên ku derçûne yê ku sîstema xwedina wan ser du salan bû)

**Girûpa yekem (2016-37 : (2017 xwendekar**

**Girûpa duyem (2017-36 : (2018 xwendekar**

Niha jî nêzî pêncî xwendekarî li beşa wêjeya Kurdî dixwînin

**Meteryalên bingegîn yê ku li beşa wêjeya kurdî tên xwendin:**

Rêzimana Kurmancî, derbirîn, xwendin û nivîsandin, dîroka zimanê Kurdî, ragihandin, pexşan, werger,zimannasî, wêjeya kilasîk, wêjeya cîhanî, zargotin, şano,wêjeya nûjen, roman, rexneya wêjeyî, hevrûkirina wêjeyî, rêbazên lêkolînê, zaravayê Soranî, zaravayê Zazakî, herûkirina zaravayê Kurdî.

**Meteryalên giştî yê ku li beşa wêjeya Kurdî tên xwendin:**

Zimanê Erebî, kompîter,bingehên zanist û lêkolînê, têgînên netewa demoqratîk, dîrok (giştî û Kurdistan) netewa demoqratîk, civaknasî, jinolojî,derûnnasiya perwerdehiyê,estetîk.

Meteryalên ku di her salekê de tên dayîn:

**Sala yekem:**

Rêziman 12+ - xwendin û nivîsandin - derbirîn - zimanê Erebî - komputer têgînên netewa demoqratîk - bingeha zanist û lêkolînê - dîrok (giştî û Kurdistan).

**Sala duwem:**

Rêziman 34+ - wêjeya kilasîk – zimannasî 12+ - civaknasî(sosyolociya) - pexşan - zaravayê Soranî - rêbazên lêkolînê - dîroka zimanê Kurdî.

**Sala sêyem:**

Zimannasî 34+ - werger - wêjeya cîhanî - wêjeya nûjen - zaravayê Zazakî- şano - derûnnasiya perwerdehiyê - zargotin - perwerdeya giştî - jinelojî.

**Sala çarem:**

Rexneya wêjeyî - hevrûkirina wêjeyî - romannasî - hevrûkirina zaravayên Kurdî - estetîk û teza derçûnê.

**Mamosteyên beşa wêjeya Kurdî:**

Bedran Penaber
Menan Cafer
Merwa Ilyas
Hacer Petekkaya
Darwên Darî
Aram Hesen
Beşîr mele Newaf
Salihê Heydo
Arif Hiso
Welîd Bekir
Menhel Xelef
Silêman Silêman
Canda Erefat
Gubuhar Eseed
Fehîm Melek
Berzo
Ciwan Birahîm
Sabit Hisên
Şêrko Yûsif
Dildarê Şeko
Tîcan Ferhan
Subhî Ehmed
Osman

Sîstema rêveberiyê li zanîngeha Rojava sîstema hevserokatî ye ( yek jin yek mêr)

Di heman demê de sîstema xweser jî heye meclisa xweser mehê carekê dicive û karê ku hatiye kirin dinirxîne û ser pirsgirêkên xwendekarên jin disekirin û çareser dike.

**HEVPEYVÎNÊN LÎ GEL XWENDEKARAN**

**Ayfer YILDIZTAN-Mexmûr**



Çima we beşe wêjeya Kurdî hilbıjart?

Sê sedemên wê hene ya yekem: Dîrok her tim bi pênûsa zilam û dewletê hatiye nivîsandin û ez naxwazim êdî kesek dîrokê ji rastiyê dûr binivîse. Divê niha dîroka jin û Kurdan bi pênûsa jinên ku wekhevî û azadiyê bingeh digrin ve were nivîsandin. A duwem: Jiyana malbata min pir zehmet derbas bû ji bo ku ez bikarim binivîsim divê pênûsa min bihêz be. Ya sêyem jî: Di damar, kurahiya giyan û dilê min de wêje heye, ez nikarim bê wêje bijîm pir ji nivîsê hez dikim loma min xwest ez xwe di vî beşî de pêşbixim. Di ....

# Li Sûriyê... Rewşa perwerde û xwendinê?!

**Nazdar Hesen**

Perwerde û xwendin di avakirin û pêşketina mirov, civak û dewletan de hîmeke bingehîn û sereke ye. Bêgûman ger tu bixwazî welatekî azad û pêşketî ava bikî divê tu bal dan û giringiyê bêtir bidî xwendin û xwendevanan, lê mixabin wek em dizanin li Rojhilata Navîn û li ba me Sûriyan ev giringî ewqas tune ye û asta perwerde û xwendinê ne wek dihat xwestin û ne jî li gor rêbazên pêşketinên nûjen dihat dandin, tevî wê jî di asta pejirandinê de bû .lê ka niha em binêrin rewşa perwerde û xwendinê piştî deh salan ji cengê gihîştiye kîjan astê ? Bi sedan dibistan hatine rûxandin û bi dehan bûn wargehên leşgerî. _Rêbaza xwendinê bû sê beş: 1-Rêbaza dewletê 2- Rêbaza rêveberiya xweser 3- Rêbaza hukumeta demkî ya kowelisyonê. Bi dehan mamosteyên pispor hatin kuştin an girtin û koçber bûn û li şûn wan mamosteyên ne pispor bi cih bûne û ji bilî rewşa ne aram li tevahiya welêt û ji ber gelek sedemên aborî û koçberiya hundirî(navxweyî), girtin û bivehiyên li ser rêyan, bi hezaran şagirt ji xwendinê qut bûn an xwendina xwe bi dawî nekirin û berê xwe dan kar. Li vê dawiyê bandora belavbûna nexweşiya Kovîd - 19 li ser girtina dibistanan, kelemek dîtir bû di rêya pirojeya xwendiniyê de yê ku ev deh sal in di rewşek pûç û sist re derbas dibe û wek welatê xwe yê ji cengê westayî can dide û li benda derhuzeyek Xwedawendiye ku vê cengê bi dawî bike, aramî û ewlehî li seranserî welêt peyda bibe û nivşekî dî ji xwendiniyê bê par nemîne.

---

**Zanîngeha... Dûmahîk**

heman demê de wêjeya Kurdî bi qasî tê xwestin negihaye xwendevanên xwe yanî mafê zimanê Kurdî tam nayê dayîn. Ji ber kû di nava civakê de wêje ji beşên din kêmtir tê dîtin.

**Hanî HİSO- Efrîn**



Rojekê ji rojan ez refa duzdeh bûm min li Şehba dixwend,pir hêviyên min hebûm lê hêviya min a mezin ez li Zanîngehê bixwînim,û bi teybet li Zanîngeha Rojava. Pir hevalên min digotin tu nikarî biçî,lê min digot:Tiştek bê derfetî nîne û ezê biçim wêjeya kurdî bixwînim.Ez li ser xwe xebitîm û gihîştim hêviya xwe û niha ez li Zanîngeha Rojava beşa wêjeya kurdî dixwînim.Her kesek li ser xwe bixebite yê bigihêje hêviya xwe.Welatê min dibin dagirkeriyê de ye vegera welatê min EFRÎN ne tenê hêviya min e,ew rihê min e,canê min e,kezeba min e,ez cangorî me ji bo Efrîna xwe,Efrîn beşeke ji Rojavayî kurdistanê ye,û ez pir kêfxweş im ku li zanîngeha Rojava dixwînim.Spas.

**Zubeyde ELÎ- Qamişlo**



Berî ku ez beşa zanîngehê hilbijêrim, ez di hemû beşan de hizirîm. Wekî ragihandin û çandinî û zimanên biyanî yê ku piraniya mirovan pê diaxivîn. Lê dema ku min ziman û wêjeya Kurdî nas kir, min dît ku ev beş pir guncawe li gorî min, tevî ku kêm agahiyên min li ser dîroka Kurdistanê û wêjeya zimanê Kurdî hebû.

Sedema herî girîng ya ku hişt ez berê xwe bidim vê beşê, ew bû ku bihêle ez mijarên cûr bi cûr li ser çanda Kurdî ya rojane û kevneşopiyên kurdan nas bikim û çavên xwe pê ronî bikim.

Bi demê re ji min re hat diyarkirin xweşbûna vî beşî û hêsanbûna wê bi sedema ku ez bi vîna xwe derbasî bûm.

Herwiha têkiliya mamosteyên zanîngehê bi şagirtên wan re, mîna têkiliya bav bi zarokên xwe re ye. Pir rehetiyê û kêfxweşiyê bi dana waneyên xwe re derbasî dilê xwendekarên xwe dikin.

Ji bilî xwendekarên wêje hin din di riya înternet (sêstema onlayn) dixwînin, ew jî mamoste û karmendên rêveberiya Xweser in. Heya niha dû gurup bi navê Komîta Perwerda Civakê (KPC) ji van herdû guruban 50 xwendekar ji hemû herêman ( Şehba, Kobanî, Reqqa, Tebqa û Qamişlo). Heta niha zêdetirî 20 xwendekaran derçûne û yên din jî berdewamin. Min hevpeyvînek bi mamosteyekê re kir û me jê pirsî:

Çima te berê xwe da zanîngeha Rojava beşa wêjeya Kurdî?

**Henan INIZ**



Ji ber ku min dixwest asta zanîna xwe pêşbixim, nemaze di wêjeya kurdî de , ji ber ku di demên berê de ev derfet tunebû , ev derfetek baş bû ji bo me , hem ast bilind dibe û hem jî ez fêrî zimanê xwe yê dayikê dibim.(komîta fêrkirina civakê).

# Îsal «Xelata Kemal Henan» Bû para nivîskar Newafê Bişar

Komîta Xelata Kemal Henan û malbata wî, Xelata Kemal Henan a salane dan nivîskar birêz Newafê Bişar û li bajarê Qamişlo radestî wî kirin. Hêjayî gotinê ye ku birêz Newaf yek ji nivîskarên bi zimanê Kurdî ye, keda wî di xebata rojnamevaniya Kurdî de heye.

Bila Xelata Kemal Henan li kekê Newaf û hemû rojnamevan û zimanhezan pîroz be.




# Milîsên «Berevaniya Niştimanî» yên girdayî rijêmê Hewldan aramiya deverê têkbibin!... Lê

Roja Sêşembê 20ê Nîsanê, mîna gelek carên din, girûpeke çekdar ji milîsên»Berevaniya Niştimanî» nişka ve, bi xinizî êrîş birin ser benda Asayişa Kornîş li Qamişlo, endamekî asayişê bi navê Xalid Osman canê xwe ji dest da û çar endam jî birîndar bûn.

Hêjayî gotinê ye ku «Taxa Tey» li başûrê Qamişlo dikeve, ew di bin destê wan milîsan de ye, ji çend salan ve, ew kiryarên xwîndar dij HSD û Asayişên rêveberiya xweser birêve dibin. Piştî vê tewanê, hêzên ewlehiyê(Asayiş) êrîş birin ser taxa tey û li tewanbaran geriyan. Di navbera herdu aliyan de şer derket. Hin xêrxwazên Kurd û Ereb û fermandarên Rûsî li balefirxana Qamişlo hewldan ku navcîtiyê bikin û vî şerî rawestînin, lê mixabin ew têkçûn û yek ji wan xêrxwazan(Şêx Hayis Ceryan) bi guleyekê hate kuştin. Îro, bi serperiştiya Rûsya, HSD û Rijêmê, rêkeftin di navbera Asayiş û wan çekdaran hate ragihandin ku ew hem ji wê taxê û hem jî ji tevaya bajêr derkevin.

Ji bo parastina aramiyê û aştiyê, destê Asayişê sax be, û mala wan aliyên alîkar ava be. Cihê pakrewanan bihuşt be û cansaxiyê ji birîndaran re hêvî dikin.




Ev gencê ku di rêwresma veşartina termê bavê xwe yê şehîd de li ser milê xortan gelogirî tê dîtin, wêneya wî hildaye û rondikên germ dibarîne!

# Endezyar Isamedîn Mihemed Elî Ewnî çû ber dilovaniya Xwedê

Li Inglistanê, roja Înê 30.04.2021Z, Endezyar Isamedîn Mihemed Elî Ewnî, Kurê dîroknasê û kesayetiya bi nav deng Mihemed Elî, birayê nivîskar û rojnamevana Kurd Duriye Ewnî, bi temenê 87 salî çû ber dilovaniya Xwedê. Isam, endezyarekî xuya û naskirî yên welatê Misrê bû.

Gorbihuşt Îsam, Kurdperwerekî çalak û xebatkarekî zîrek bû, valahiyek li şûna xwe hişt.

Cihê wî bihuşt be, serê malbat, dost û hevalên wî û gelê Kurd sax be!



**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**